



*Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)*



*wergera ji erebî: Mustefa Reşîd*

## Tîrêjên Çarşembê

### Xelek - 42

## Şopên (Hûrî / Xûrî) di kelepura kurdî da Beşê duwem - bakur û rojavayê Kurdistanê

Kelepura gelan beşek ji nasnameya wane. Di bin bandora hin rewş û nîrên siyasî çandî zor û zehmet da dibe ku hin tişt ji wê kelepore wenda bibin, lê hin tişt jî - tevî guhartin û tewandina wan - dîsa aşkere û diyar dimînin. Rewşa nav û têngîna (*Hûr = Hûr = Hor = Xûr = Sûr*) bi şewaz û maneyên xwe yê ayînî û nijadî jî bi vî awayî ye. Hin tişt jê di kelepura kurdî da heya niha jî mane. Me hin şopên wê di kelepura rojhilat û başûrê Kurdistanê da pêşkêş kirin û niha jî emê hin şopên wê di kelepura bakur û rojavayê Kurdistanê da bînin ber çavan.

### Yekem - di kelepura bakurê Kurdistanê da:

- **Oraman:** Navê êleka kurdî ye li nêziya bajarê Oraman, li rojhilatê herêma Hekarî ya bakurê Kurdistanê dimîne. Gelek diyare ku navê vê êlê ji du beşan pêktê ku ew jî evin (*Oram = Horam = Hûram = Hûrem = Xûrem*) bi maneya (roj / xwedayê rojê) û beşê (an) ku nîşana gelemariyê di zimanê kurdî da ye.
- **Ûrfa:** Niha bi zimanê turkî jêra (Şanlıurfa) dibêjin; yanê Ûrfaya şanîdar, Ûrfaya serberz. Hin caran jî dibêjin (bajarê pêximberan). Ev bajar di nawenda erdnîgariya hûrî da ye. Bi zimanê suryanî jêra dibêjin (*Ûrhê*) yan jî (*Ûrhay*). Bi erebî jêra gotine (*Ruha / El Ruha*). Peywendiya van hemû şewazan bi peyva (*Ûr = Hûr = Hor = Xûr*) ra heye. Bi zimanê latînî ji Ûrfayê ra **Edessa** dibêjin. Heya niha jî ev şar nawenda parêzgeha Ûrfayê ye.



(şûna Ûrfayê di nexşeya Turkiya niha da)

- **Haran (Ĥerān) (حاران):** Navê xwe bi erebî wisa ye û bi înglîzî (*Haran*) tê nivîsandin. Ev şar bi 44 km li başûr-rojhilatê Ûrfayê, li nêziya kaniyên çemê Belîx dikeve. Ev

şarekî hûrî pir kevine; dîroka wî here kê m vedigere çarîkê dawîn yê hezarsala sêhem b.z. Ev şar li ser rêya bazirganiyê ya sereke ye ku Mêzopotamiya bi Anatoliyayê û Sûriyayê va girêdide. Dema ku *Madan* û *Keldanan* bi hev ra sala 612-an b.z. emperatoriya *Aşûr* roxandin, bajarê *Êranê* bû para padîşahiya keldanî. Di pey ra padîşahê *Madan* ya dawîn *Ezdehak* ew vegerand û da ser emperatoriya *Madan*.



*Êran* li ba Yûnanan (*Girekan*) bi navê (*Karan*) hate naskirin û li ba Roman jî bi navê (*Kariya*). Peywendiya van hemû navan bi navê (*Hûr*, *Hûran*, *Hûr*, *Hor*, *Hûran*, *Horan*, *Har*, *Kar*) ra heye. Helbet diyare ku dengê (H) (ح) di zimanên ariyanî da, her wisa di kurdî da jî nîne. Ji lew ra, navê (*Êran*) ji navê (*Haran*) ku ew jî ji navê (*Hûran*) hatiye guhartin; yanê (*Hûriyan*, *Horiyan*) ku tê maneya (warê *Hûriyan*). Di erdnîgariya kurdî da nimûne pirin ku navê cih li gor navê hoz û êla ku li wir dimîne ye. Wek nimûne em dikarin (*Loristan*, *Soran*, *Barzan*, *Şêxan*, *Şêrewan*, *çiyayên Bextiyaran*, *çiyayên Hekariyan*) û hwd. bi nav bikin.

- **Hormik:** Navê êleka kurdî li bakurê Kurdistanê ye, ayîna wê elewîti ye (*yarsanî*, *kakayî*). Vê êlê li gel êla Lolan ya kurdî elewî di destpêka sedsala bîstan da li dijî Dewleta Osmanî serî hilda. Hin rêveberên alayên Hemîdiye di şikandina vê şoreşê da beşdar bûn û serekên wan kuştin. Rêveberên van alayên Hemîdiye jî kurdên sunnî bûn. Yek ji wan efser Xalid Cebran bû. Ji lew ra, dema ku şoreşa 1925-an bi rêveberiya Şêx Seîd destpêkir, ev herdu êl jî ber kîna wan derbarê alayên Hemîdiye beşdarî şoreşê nebûn û li dij rawestiyên.

### Duwem - di kelepora rojavayê Kurdistanê da:

- **Ûzelk (Ûzelik):** Navê dareka biçûke, di biharê da şîn dide û di havîn û payîzê da kesk dimîne. Berê vê darê gilover û biçûke. Dayîk û dapîrên me ew dicivandin, hişk dikirin û ji wan ev tora (*ûzelik*) durist dikirin. Awayê wê wisa ye ku jora wê sêkoşe ye û jêra wê çarkoşe ye. Ev (*ûzelik*) bi dîwarê malê va dihate daleqandin. Li herêma Çiyayê Kurmenc (Efrîn) hema li her malekê hebû. Dirûvê wê dişibihe kesê xaçkirî.



(tora ûrzelik)

Wisa tê xuyakirin ku daleqandina *ûrzelikê* di hundirê malan da semboleka ayînî ye daku mal çavînî nebe. Wek ku hevjiyîna min dibêje: Dema ku zarokek pir dişeridî, xwediyên bawer dikir ku ew çavînî bûye. Radibûn agirek dadidan, mistek ji libên *ûrzelika* hişkkirî davêtin nava agir û zarok di ser dûmanê agir ra sê caran digelandin daku ji çavên dexsok sax bibe.

Bi herhal, navê (*ûrzelik*) ji sê beşan pêkhatiye (*ûr + zel + ik*). Beşê (*ûr = hûr = xûr*) û beşê (*zel = zer = zerd*) rengê zere û beşê (*ik*) bişûkkirina nave. Em bawer dikin ku duristkirina (*ûrzelik*) peywendiya xwe bi nîşanên ayînî yên kelepura mîtrayî ra heye ku yek ji şaxên yezdaniyê ye û wisa şopên wê di êzdîti û yarsaniyê (kakayî = elewîti) da mane.

- **Urkish:** navê paytextekî Hûriyane û li wir perestgeha xwedayê hûrî (*Kumarbi*) hebû. Wisa tê bawerkirin ku dîroka vî bajarî vedigere nîvê duwem yê hezarsala sêhem b.z. Ev bajar li derdorên çemê Xabûr dikeve. Herdu arkêologan Van Liere û Hrouda gotine ku şopa vî bajarî li girekî ye li bakurê bajarê Amûdê dikeve. Bi herhal, navê (*Ûrkish*) ji du beşan pêktê (*Ûr = Hûr = Xûr*) û (*kîş*). Dibe ku beşê (*kîş*) ji peyva (*geş*) hatibe guhartin. Helbete (*geş*) tê maneya (bi ronahî, ronak, diçirise). Heger wisa be, hîngê maneya bajarê (*Ûrkish*) dibe (warê ronahiyê).



(Qesra padîşahî li Êrkîsh)

- **Xûriz:** Navê texlîtekî tiriye sore (li herêma Efrîn wisa jêra dibêjin: Tiriye Xûriz). Bala xwe bidin peywendiya rengê sor bi xûr ra. Navê (*xûriz*) ji elok ra jî dibêjin. Divêt em

bêjin ku girîngiyeka (dîk) di kelepura yezdanî da heye û heya niha jî di kelepura êzîdî da bi şêwazê (taw) maye ku hatiye guhartin û bûye (tawûs). Emê di lêkolînên taybetî bi kelepura yezdanî da li ser vê mijarê rawestin.

- **Şêx Xûrz:** Navê gundekî ser bi navçeya Bilbilê li quncikê bakur-rojhilat yê herêma Efrînê ye. Di wê erdnîgariyê bi xwe da çiyayê (*Hawarê*) û keleha (*Nebî Hûrî*) û gora (*Nebî Hûrî*) heye. Maneya (*Şêx Xûrz*) tê maneya (şêx şems). Wek tê zanîn (*Şêx Şems*) yek ji mezinên ferîştan di ayîna êzîdî da ye û (*Şêx Şemsedîn*) navê lawê (*Şêx Adî*) ye jî.



(gundê Şêx Xûrzê)

- **Xûrşîd:** Navê mêran li rojavayê Kurdistanê ye û bi herhal li beşên din jî heye. Ev nav ji du beşan pêktê (*xûr*) bi maneya (roj) û (*şîd*) bi maneya (tîrêj), yanê (ronahiya rojê).
- **Harûnî:** Navê êleka kurdî li herêma Cizîrê (rojavayê Kurdistanê) ye; wek ku birêz Kardox Şemikî gotiye. Divêt em bêjin ku navê (*Harûn*) ne navekî erebî ye. Bi erebî ti maneyê nade. Ev nav ji zimanê ibranî, ji navê (*Haran*) ku di qur'anê da heye, hatiye erebkirin. Ev navê birayê pêximber Îbrahîme. Peywendiya vî navî bi bajarê (*Haran = Hûran = Hêran*) ra heye. Dibe ku em li ser vê mijarê di lêkolîneka dahatî da rawestin.
- **Hawar:** Navê zincîreka çiyayî ye li beşê bakur yê herêma Çiyayê Kurmênc (Efrîn), li rojavayê Kurdistanê. Di jêderên erebî-îslamî da ev nav bi şêwazê (*Cebel El Hûwar*) (جبل الحوار) hatiye [[El Belazurî](#), vekirina welatan, rûpel 165-166].



(Çiyayê Hawarê)

- **Horo:** Yan jî (Horîk). Ev navê mêrane li herêma Efrîn; bi taybetî jî li navçeyên nêzî Çiyayê Hawarê û keleha (*Nebî Horî*). Ji jinan ra jî (Horê, Hûrê) tê gotin. Bi herhal ev nav li herêmên din yê Kurdistanê jî heye.

- **Horî (Hûrî):** Navê kelahekê li herêma Efrînê ye. Li teniştê wê gora (*Nebî Hûrî*) heye. Di hin jêderên erebî da jêra gotine (*keleha Qurs*) (قلعة القُرس). Ev ji şêwazê latînî (*Churus*) hatiye erebkirin. Em wisa dibînin ku ev nav ji şêwazê (*Xûrz = Xûr = Hûr = Hor*) hatiye guhartin û tîpa (s) di wergera yûnanî da hatiye ser. Dîraknas Kamil El Xezî (كامل الخَزِي) di pirtûka [*Nehir El Zeheb fi tarîx Heleb, 1/289*] bi şêwazê (*Qours, Qurs*) gotiye. Li pirtûka [*Ibin El Edim: Buxyet El teleb fi tarîx Heleb, 1/178*] binêrin.



(Şopên dika romanî li keleha Nebî Hûrî)



(Gora Nebî Hûrî)

Ev bûn hin nimûne ji kelepura kurdistanî ku di kûraniya xwe da bi navê (*Hûr, Hûr, Hor, Xûr, Sor*) ra bi maneyên xwe yê nîjadî û ayînî girêdayî ye. Heger lêkolînerên Kurd di kelepura kurdistanî da li her çar beşên Kurdistanê li van tiştan bigerin, ewê pir nimûneyan bibînin.

Çarşemb, 13.01.2016